

**Sê k'itêbêd ji Peymana Kevin
R'ût', Ester, Ûnis**

Sê k'itêbêd ji Peymana Kevin

R'ût', Ester, Ûnis

Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîroz
Moskva
2009

**Sê k'itêbêd ji Peymana Kevin
R'ût', Ester, Ûnis**

bi zaravê k'ur'dîya-kurmancî

Bona p'irsêd xwe bi vê navnîşê binivîsin:
ibt_inform@ibt.org.ru

ISBN 978-5-93943-135-4

© Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîroz,
Moskva, 2009

Sernivîsar

Mesîhîyêda Nivîsara Pîroze miletê cihûyar'a tê gotinê Peymana Kevin. Peymana Kevin t'emamîya xweva 39 k'itêb in, k'îjan ku bi destê gelek nivîsk'ara hatine nivîsarê. Gelek ji van k'itêba bi zimanê cihûtîya berê hatine nivîsarê. Hinek p'arêd k'itêba Peymana Kevin sê h'ezar sala zêdetir in ku hatine nivîsarê. Peymana Kevinda hene k'itêbêd dîrok û qanûnê, hilbesta, şîretêd merivêd serwaxt û p'êxembertîyêd ku têne sêrî. Evana haqasî cûr'e-cûr'e bûn, lê fikirêd wan h'emûya jî ser nêtekê bû, awa gotî bona heleqetîya Xwedêye t'evî miletê cihû. Meremê Wî ew bû, ku ew duayê xwe ser h'emû miletada bibarîne k'îjan ku wî bawar bikin û guhdariya wî bikin.

Ji van kitêba, sê k'itêbêd Peymana Kevin, cara pêşin bi zimanê k'urdîya kurmacî, alîyê Înstîtûta welger'andina Bîblîyayêda hatine

Sernivîsar

welger'andinê. Evana cûr'ê qewimandina nivîsara cihûyaye pîroze kevin berbiç'e'v dikin. Ev her sê k'itêb nava xweda sê demêd başqeye dîroka cihûya didine k'ifşê, ji qur'na 11-da h'eta qur'na 5-a berî bûyîna Îsa. Ev welger'andin ji kanîya e'sasî hatîye hildanê, awa gotî t'evî têk'sta Îbranî hatîye r'ûbarî-hevkinê.

Em vê yekêda guman in, ku xwendevanêd k'urd, vê k'itêbêda ne ku wê t'enê dîroka serhatîyêd h'eyre-h'ujmek'ar bibînin, lê belê usa jî wê r'astîya Xwedêye hindava mêrivda bih'esin.

Înstîtût r'azîbûna xwe dide welger' û serr'astkirêd van k'itêba.

*Xebatk'arêd Înstîtûta Welger'andina
K'itêba Pîroz*



K'itêba R'ût'

Pêşgotin

Serhatîya R'ût' 1100 sal berî bûyîna Îsa qewimîye, wî çaxî hê p'adşa serwêrtî Îsraêlê ne dikirin. Ev serhatîya e'dile berdil, bona xweyîe'sila çawa ç'e'vkanîya avêye ku ber'îya bêwada e'mir dida merivêd gunek'ar. ²Ev serhatî li ser qîzeke Mowabîye cahil hatîye nivîsarê. Mowab dewleteke r'ex Îsraêlê bû. Pey mirina mêrê xweyî cihûr'a, R'ût' dide k'ifşê ku çiqasî dilê wê xasîya wê Nahomîyêva girêdayî bû. R'ût' miletê cihûya qebûl dike çawa miletê xwe û Xudanê wan qebûl dike çawa Xudanê xwe. Qencî û berbihêrîya R'ût'ê ji alîyê Xudanda nayê bîrkinê. Serxwebûn û xîreta wê Bowazê pismamê

R'ût' 1

wêva jî e'yan dibe. Li gora qanûna Îsraêl Bowaz R'ût' t'ê distîne û dîsa çerxa Nahomîyê r'ast dibe. ³ Xilazîya k'itêbê bona r'ik'inyatê tê nivîsarê. Ew dide k'ifşê ku kur'ê Bowaz û R'ût'ê bûye kalkê p'adşayê Îsraêlê-yî mezin, awa gotî Dawid. Anegorî qanûna pîroz li Qanûna Ducarî 23:3-da îzina mowabîya t'unebû ku t'evî milletê Îsraêl bûna, lê R'ût' bû pêşeke Îsa Mesîh (Metta 1:5). Eva k'itêba hîn dike, wekî meriv r'ast bawarîya xwe Xudan bîne û anegorî e'mirê wî bijî, Xudan li pirsêd navmiletîyê nanihêr'e. ⁴ Anegorî e'rf-e'detê cihûya eva k'itêba li k'inîştada r'oja Pên-cîye h'esabda tê xwendinê.

1

Elîmelex neferêd xweva diçe Mowabê

¹ Hêna serwêrtîya h'akimada welêtda bû xelayî. Ji Beytleh'ma Cihûda merivek t'evî k'ulfeta xwe û her du kur'êd xwe çû e'rdê Mowabê xerîbîyêda ma. ² Navê wî merivî Elîmelex* bû, navê k'ulfeta wî Nahomî bû, navê her du kur'a, yek Mah'lon bû, yek jî K'îlyon. Evana Efrat'î bûn, ji Beytleh'ma Cihûda çûne e'rdê Mowabê û

* 1:2 Bi zimanê Îbranî: «Xwedê p'adşê min e».

R'ût' 1

li wir man. ³Mêrê Nahomîyê Elîmelex mir, Nahomî her du kur'ava man. ⁴Van her du kur'a qîzêd Mowabîya standin, navê yekê Orpa bû, navê yekê jî R'ût'. Evana li wir weke dehe sala man. ⁵Paşê her du kur'ê wê Mah'lon, K'îlyon jî mirin û evê k'ulfetê her du kur' mêrva unda kirin.

⁶Pey vê yekêr'a eva r'abû ku t'evî her du bûkêd xwe ji e'rdê Mowabê vege'ê welatê xwe, çimkî evê e'rdê Mowabêda bihîstibû, ku Xudan serî li cime'ta xwe xistîye, r'isqê wan gîhandî ye. ⁷Eva ji wî cîyê xwe, t'evî her du bûkêd xwe r'abû ku r'êk'êve vege'ê welatê Cihûda. ⁸Hingê Nahomîyê gote her du bûkêd xwe: «Her'in lawo, her kes vege'ê mala bavê* xwe. Bira Xudan r'e'ma xwe li we bike, hûn hindava min û mêrêd xweye mirîda çawa bûne, ew weke wê yekê jî bîne pêşîya we. ⁹Bira Xudan bextê we veke, her kes ji we mala mêrê xweda sit'ar be». Pey vê gotinêr'a Nahomî çû r'ûyê wan, hingê zûkîn k'ete wan ew girîyan ¹⁰û gotin: «Na, emê jî t'evî te li ser miletê teda vege'ê». ¹¹Lê Nahomîyê gote wan: «Na qîzêd min, paşda vege'ê min, hûnê t'evî min bêne çî? T'u bet'inê minda kur' hene, ku ew bibine mêrêd we? ¹²Paşda vege'ê min her'in qîzêd

* 1:8 Xeber bi xeber: «Mala dîya xwe».

R'ût' 1

min, çimkî min îdî salêd xwe derbaz kirine, ez xa îdî mêr nakim. Yan heger min bigota guman heye, ku ezê îşev mêr kim kur'a bînim, ¹³ gelo hûnê haqas wext bimana, h'eta ew mezin bûna? Yan bona vê yekê hûnê bimana weyê mêr nekirana? Na qîzêd min, dilê min ji we ze'ftir li ser we dêşe, çimkî destê Xudan li ser min giran bûye». ¹⁴ Ê wan dîsa kire zarîn û girîyan. Orpa çû r'ûyê xwesîya xwe vege'îya, lê R'ût' ji wê neqetîya.

¹⁵ Hingê Nahomîyê gote R'ût'ê: «Va ye jint'îya te li ser cime'ta xwe û xwedêyêd xweda vege'îya, tu jî li pey jint'îya xwe her'e». ¹⁶ Lê R'ût'ê gotê: «P'êyî li ser min neke, ku ez ji te biqetim dûr k'evim, çimkî tu k'uda her'î ezê bêm, tu li k'u bimînê ezê jî li wir bimînîm. Cime'ta teyê cime'ta min be, Xwedê teyê Xwedêyê min be. ¹⁷ Tu li k'îderê bimirî ezê jî li wir bimirim û li wir bême defin kirinê. Çi hatîye li serê min, bira Xudan ji vê yekê xirabtir bîne li serê min, heger pêştirî mirinê, tiştêkî mayîn min ji te biqetîne». ¹⁸ Gava Nahomîyê dîna xwe dayê, wekî evê nêta xweda danîye ku e'se t'evî wê her'e, îdî zor lê nekir.

¹⁹ Hingê her duya hevr'a dane li ser r'ê h'eta Beytleh'mê çûn. Ê gava k'etine Beytleh'mê, h'ej

R'ût' 1, 2

k'ete t'emamîya bajêr û k'ulfeta digotin: «Eva Nahomî ye?» ²⁰ Lê ewê digote wan: «Minr'a nebêjin Nahomî*, lê minr'a bêjin Mara**, çimkî Yê Herî Zor derd û kulava ez danîme. ²¹ Ez t'êr-t'ijî derk'etim çûm, lê Xudan ez destvala vege'andim. Îdî çima bêjine min Nahomî? Heger Xudan çerxa min ç'ep kir û Yê Herî Zor ez kirime vê r'ojê?» ²² Bi vî awayî Nahomî t'evî bûka xwe R'ût'a Mowabî, ji e'rdê Mowabîyê vege'îya û wextê destpêkirina ce'hdîrûnê gihîştine Beytleh'mê.

2

R'ût' zevîya Bowazda simbila t'op dike

¹ Pismamekî malmêranê Nahomîyê hebû. Eva ji r'ik'inyata Elîmelex bû, yekî xweyîhebûk, bi nav û deng bû, navê wî Bowaz bû. ² R'ût'a Mowabî gote Nahomîyê: «Ez her'ime nava zevîya, dilê k'ê li ser min bêşe, ez pey wî her'im simbila t'op kim». Ewê gote wê: «Her'e qîza min». ³ Û R'ût' çû k'ete zevîkê, pey nandîrûya simbil t'op kirin. Û jêr'a usa lihev hatibû, ku ew k'etibû zevîya Bowazê ji r'ik'inyata Elîmelex. ⁴ Awa Bowaz ji

* 1:20 Omidayî, dilşewat.

** 1:20 Te'layî, dilêşî.

R'ût' 2

Beytleh'mê hat gote nandirûya: «Xudan qewata wer'a be!» Wana lê vege'and û got: «Bira Xudan dua li te bike!»⁵ Hingê Bowaz ji xulamê ku çawa serwêr li ser nandirûya k'ifş kiribû pirsî: «Eva qîza k'ê ye?»⁶ Xulamê serwêrê nandirûya lê vege'and û got: «Eva qîzika Mowabî ye, ya ku t'evî Nahomîyê ji e'rdê Mowabîyê vege'îyaye hatîye. ⁷ Evê gote me: «Îzina we hebe ku ez pey nandirûya simbila biçinim û ji nava qewşada jî t'op kim». Vê sibê zûva eva hatîye û h'eta niha ew li vir e, qet neçûye malê r'ih'et be jî». ⁸ Hingê Bowaz gote R'ût'ê: «Bibihê qîza min, neçî e'rdê xelqêda t'op nekî û ji vir jî dûr nek'evî, lê li vir cem carîyêd min bimînî. ⁹ Dîna xwe bide wê zevîya ku ew didirûn û li pey wan her'e. Min bona te t'emî daye xulama, ku qedirê te nak'evin. Gava t'îbî jî, nêzîkî derdana bî û ji ava xulama k'işandî vexwî». ¹⁰ R'ût' dever'ûya çû e'rdê û li ber ta bû gotê: «Eva ji çîye ku dilê te haqasî li ser min dêşe û bona min jî haqasî pirs-pirsîyara dikî? Ne ez yeke xerîb im?» ¹¹ Hingê Bowaz lê vege'and û gotê: «Pey mirina mêrê xwer'a, te çi qencî xwesîya xwer'a kirîye, h'emû kirinêd te minr'a gilî kirine. Usa jî e'yan e ku te çawa dê û bavê xwe û welatê xwe hiştîye û hatî gihîştî wê cime'tê, k'îjan ku

R'ût' 2

te pêşda nas nedikir. ¹²Bira weke kirina te Xudan bîne pêşîya te û bira Xudan Xwedêyê Îsraêl li ser te da bibarîne, wekî tu hatî bin p'erê wîda sit'arekê bibînî». ¹³Hingê R'ût'ê gotê: «Xweyê min, ez dibînim ku dilê te li ser min dişewite, çimkî tu ber dilê minda hatî û te t'evî carîya xwe şîrin-şîrin xeber da, lê r'ast ez weke carîke te jî nînim». ¹⁴Bowaz wextê nanxwarinê gote wê: «K'erem ke ser nê nê û pe'rîyê xwe sirkêda ke». R'ût' t'evî nandirûya r'ûnişt. Ewî firîkêd qelandî dane wê, ewê xwar t'êr bû û ber jî ma. ¹⁵Gav ewa r'abû çû simbila t'op ke, Bowaz t'emî da xulamêd xwe û got: «Bira ew ji nav qewşada jî t'op ke û wê nedine şermê. ¹⁶Bona xatirê wê ji qewşa jî bavêjine e'rdê û bihêlin bira t'op ke, bêxatirîya wê nekin».

¹⁷Ewê h'eta berê êvarê wê zevîyêda t'op kir û gava ew k'uta, bû t'orpe ceh. ¹⁸R'ût'ê t'orpê xwe hilda çû bajêr û xwesîya wê ew cehê wêyî t'opkirî dît, hingê R'ût'ê ew bermayîê ji wî xurekê ku pê t'êr bibû jî derxist da wê. ¹⁹Hingê xwesîyê jê pirsî û gotê: «Îro te ji k'u t'op kirîye û li k'u xebitî yî? Bira dua li wî be, yê ku ter'a kirîye qencî». Hingê ewê xwesîya xwer'a gilî kir, ku cem k'ê xebitîye û got: «Navê wî merivê ku ez îro cem wî xebitîme Bowaz e».

R'ût' 2, 3

²⁰ Nahomîyê gote bûka xwe: «Bira duayê Xudan li wî be, ku ewî pişta xwe neda mirî û zêndîya». Nahomîyê gote wê: «Ew meriva yekî ji r'ik'inyata me ye, pismamekî meyî nêzîk e, gerekê alî me bike*». ²¹ Hingê R'ût'a Mowabî got: «Ewî usa jî gote min: «Ji xulamêd min dûr nek'evî, h'eta ku ew nandirûna min xilaz nekin». ²² Nahomîyê bûka xwe R'ût'r'a got: «Qenc e qîza min, ku tu t'evî carîyêd wî her'î-bêyî û te nava e'rdê xelqêda nebînin». ²³ R'ût' ji carîyêd Bowaz dûr nek'et, h'eta xilazîya ceħdirûn û genimdirûnê simbil t'op dikirin û li cem xwesîya xwe jî dima.

3

R'ût' ji Bowaz de'wa pismamtîyê dike

¹ Xwesîya R'ût'ê, Nahomîyê gote wê: «Qîza min, ez dixwazim ku te sit'ar kim, ku axirîya te xêr be. ² Va ye Bowazê ji r'ik'inyata me, cem carîyêd k'î-janî tu dimayî, ewê îşev bêderêda cêh bide bê. ³ R'abe niha serê xwe bişo, r'ûnê bînxweş li xwe de, xemila xwe li xwe ke û berjêrî bêderê be, lê tu xwe nîşanî wî nedî, h'eta ew xwarin-vexwarina

* ^{2:20} Qanûna Ducarî 25:5-10; Qanûna K'ahîntîyê 25:47-49; Îbo 19:25; Îşaya 49:26.

xwe xilaz neke. ⁴ Û gava ew dike ku r'azê, tu gosqu-laxîya cîyê r'azana wî bike û her'e bînp'îyêva bik'e-ve cîyê wî p'alde. Hingê ewê ter'a bêje, ku tu çi gerekê bikî». ⁵ R'ût'ê gote wê: «Te çi t'emî dane min, ezê h'emû tiştî jî usa bikim».

⁶ Ew berjêrî bêderê bû û xwesîyê çawa t'emî dabûyê, ewê usa jî kir. ⁷ Bowaz pey xwarin-vexwarinê-r'a, k'êfa wî cî, çû ber cehê lod kirî p'alde ku r'azê. Hingê ewa tele-tel çû, bînp'îyêva k'ete nava cîyê wî p'alda. ⁸ Nîvê şevê ew meriv veciniqî, vejer'îya dîna xwe dayê, va ye k'ulfetek bînp'îyêda p'aldayî ye. ⁹ Ewî jê pîrsî: «Tu k'ê yî?» Ewê gotê: «Ez carîya te R'ût' im, p'êşa xwe bavêje li ser carîya xwe, çimkî tu pismamê minî nêzîk î». ¹⁰ Ewî gotê: «Duayê Xudan li te be qîza min! R'astîya teye vê axirîyê ji ya pêşin qenctir e, çimkî tu pey cahilêd k'esîb yan dewletî neçûyî. ¹¹ Niha qîza min netirse, te çi minr'a got ezê bikim, çimkî t'emamîya cime'ta bajêr zane, ku tu k'ulfeteke xweyê'sil î. ¹² R'ast e ku ez pismamê te me, lê nava pismamtîya meda yekî hê nêzîk heye. ¹³ Îşev li vir şeva xwe derbaz ke. Sibehê zû heger ew alîyê borcdarîya pismamtîyêda te qebûl ke, ew tiştekî qenc e, bira qebûl ke, lê heger ew borcdarîya pismamtîyê nexwaze biqedîne te qebûl ke, hingê

ezê biqedînim û te qebûl kim. Xwedê heye! P'alde li vir h'eta sibê».

¹⁴ Evê h'eta k'ewê sibeyê binp'îya wîda p'alda û usa zû r'abû, ku hê t'u kesî nikaribû kesek nas kira. Û hingê ewî gotê: «Bira t'u kes nizanibe, ku k'ulfet k'etîye bêderê». ¹⁵ Paşê gote wê: «Şala li ser xwe bîne vir bigire». Ewê ew girt û Bowaz şeş kod ceh çap kir, da li ser mila û ew çû bajêr. ¹⁶ Ewa jî çû cem xwesîya xwe û wê jê pirsî: «Qîza min, tu çawa yî?» Ewê xwesîêr'a gilî kir, çî ku wî merivî bona wê kiribû. ¹⁷ Paşê jî xwesîyêr'a got: «Ev şeş kod ceh ewî da min, got: «Destvala li ser xwesîya xweda venege-r'e»». ¹⁸ Hingê Nahomîyê gotê: «Qîza min niha sebir ke, h'eta ku bizanibî ev şixulê wê çawa bê sêrî, çimkî ew meriva h'eta îro evî şixulî safî neke, dilê wî r'ih'et nabe».

4

Bowaz R'ût'ê distîne

¹ Bowaz çû li ber dergehê* bajêr r'ûnişt. Û awa ew pismamê ku Bowaz be'sa wî kiribû derbaz

* ^{4:1} Wî çaxî meydana nêzîkî dergehê bajêr ew cîyê bona t'ucaretîyê, dîwanê û qirara bû.

dibû. Bowaz navê wî hilda gazî kirê û gotê: «K'erem ke xêlekê li vir r'ûnî». Ew jî vege'îya r'ûnişt. ² Paşê Bowaz gazî dehe r'ûsipîyêd bajêr kir û gotê wan: «K'erem kin li vir r'ûnên». Ew jî r'ûniştin. ³ Hingê Bowaz gote wî pismamî: «Nahomîya ku ji e'rdê Mowabê vege'îyaye hatîye, dixwaze wî e'rdê p'ara birê me Elîmelex bifiroşe. ⁴ Ez fikirîm ku vê yekê bigihînime guhê te û ter'a jî bêjim, wekî tu pêş hazirêd r'ûniştî û r'ûsipîyêd cime'ta minva vê p'arê bik'ir'î. Heger tu dixwazî bi îzina pismamtîyê vê p'arê bik'ir'î, bik'ir'e. Lê heger naxwazî, minr'a beje ku ez zanibim, çimkî pêştirî te îdî t'u kes t'une ku borcê pismamtîyê biqedîne. Pey ter'a li min dik'eve». Ewî got: «Belê ezê borcê pismamtîyê biqedînim» ⁵ Hingê Bowaz li ser vê yekêda zêdekir û gote wî pismamî: «Vê jî zanibe, gava wê r'oja tu ji Nahomîyê wî e'rdî bik'ir'î, gerekê jina yê mirî, R'ût'a Mowabî jî bistînî, wekî warê yê mirî şîn kî, ku navê wî unda nebe*». ⁶ Hingê wî pismamî got: «Ez vî borcê pismamtîyê nikarim biqedînim, nebe ku ez warê xwe r'eş kim. Vî borcê pismamtîya min tu biqedîne, çimkî ji qewata min der e». ⁷ (Berê nava

* 4:5 Qanûna Ducarî 25:5-10.

R'ût' 4

Îsraêlda ev yek hebû, k'ir'in yan firotanekêda ku her tişt bi şe'detî û îzbatî bibûya, hingê mêriv sola nigê xwe dêxist û dida hevalê xwe. Û ev yek Îsraêlda dibû şe'detî.) ⁸ Paşê wî pismamî gote Bowaz: «Tu xwer'a bik'ir'e». Û sola nigê xwe êxist da wî. ⁹ Wî çaxî Bowaz gote wan r'ûsipîya û t'emamîya cime'tê: «Hûn îro şe'de ne, ku min h'emû hebûka Elîmelex, K'îlyon û Mah'lon ji Nahomîyê k'ir'î. ¹⁰ Û jina Mah'lon, R'ût'a Mowabî jî min xwer'a jin stand, wekî navê yê mirî ji nava biratîya wî û cî-warêd wî unda nabe. Bona r'oja îroyîn hûn şe'de ne». ¹¹ Hingê h'emû cime'ta ber dergeh, r'ûsipîyava t'evayî gotin: «Em şe'de ne. Bira Xudan wê k'ulfeta ku wê bik'eve mala te, bike mîna R'ahêlê û Lêayê, k'îjana ku mala Îsraêl ava kirin. Tu nava Efrat'êda qewat bî û Beytleh'mêda jî navekî qazinc kî. ¹² Bira mala te bibe mîna mala Pêrês, çawa ku T'amarê ji wê malê zur'et li pey Cihûda xist, usa jî Xudanê ji vê k'ulfeta cahil bide te».

¹³ Bowaz R'ût' stand, ew bûne h'elalê hev. Bi r'e'ma Xwedê ew h'emle derk'et û kur'ek anî. ¹⁴ Hingê k'ulfeta gote Nahomîyê: «Şikir ji Xudan, ku ewî îro tu bê zur'et bê pismamê nêzîk nehiştî, wekî navê vê r'ik'inyatê Îsraêlda neyê bîrkinê! ¹⁵ Bira eva t'ifala bibe bîna li

R'ût' 4

ber te û şiva destê te, e'mirê mezinayîyêda, çimkî eva ji wê bûka ku te h'iz dike dinê k'etîye, ya ku ter'a ji h'eft kur'a çêtir e». ¹⁶ Pey vê gotinêr'a Nahomîyê kur'ik hilda da h'emêza xwe û jêr'a bû berdergûş. ¹⁷ K'ulfetêd cînara nav lê kirin û gotin: «Nahomîyêr'a kur'ek bû» Ê navê wî Ovêd danîn. Eva bavê Yêşayê bavê Dawid bû.

¹⁸ Ê zur'etêd Pêrês ev in: Ji Pêrês Hesrûn bû, ¹⁹ ji Hesrûn R'am bû, ji R'am Amînadav bû, ²⁰ ji Amînadav Nehşon bû, ji Nehşon Salmon bû, ²¹ ji Salmon Bowaz bû, ji Bowaz Ovêd bû, ²² ji Ovêd Yêşa bû, ji Yêşa jî Dawid bû.



K'itêba Ester

Pêşgotin

K'itêba Esterê dide k'ifşê ku çawa t'emamîya milletê cihû ji qir'kirinê hate xilazkirinê. Eva serhatîya berî bûyîna Îsa qur'na 5-da qewimîye. Wê hingê împêratorîya Faris û Medyanîya serwêrîya t'emamîya R'ohilata Nêzîk dikir, ji Hindistanê girtî h'eta Afrîkayê. Gava Farisa serwêrîya împêratorîya Babîlonê sala 539 (berî bûyîna Îsa) hildane destê xwe, hingê wana îzin da wan cihûyêd ku alîyê Babîlonêda hêsîr hatibûne birinê, ku vege'rine welatê xwe. Lê gele cihûya ev mecal ji destê xwe kirin veneger'îyan, ew cîyêd xweda ji Filistî-nê der belabûyî k'omelêd cihûtîyêda man. Lê çimkî

cihû alîyê h'ebandin û e'detêd xweva gelekî ji miletêd dor-berêd xwe firqî dibûn, ev yek dibû sebab ew li ber ç'e'vê mileta r'eş dibûn û wanr'a dibûne dijmin. Ev dijminayî aşkela nava Hamanê wezîrê p'adşê Farisa û Mordok'ay cihûyê qulixk'arda k'ifş dibe. ² Estera qîzapa Mordok'ay, ku cîyê xanima p'adşê Faristanê digire, ev yeka dide k'ifşê ku Xwedê çawa, cime'ta xwe ji tengasîya h'eta ber derê mirinê jî xilaz dike. Tiştêkî e'cêbmayî ye, ku kanîya vê têksta îbranîda qet carekê r'astî navê Xwedê nayên û heleqetîya wî vê serhatîyêda aşkela nade k'ifşê. Lê yê ku vê k'itêbê k'ûr dixûne tê derdixe, ku ev serhatîya qewimî hema usa ne bi serê xwe bûye. R'astî Yê Herî Zor, Xudan cime'ta xwe bi destê meriva, awa gotî Esterê, Mordok'ay û p'adşê Faristanê xilaz dike, k'îjan ku kirine li ser wan qulixa, ku şewira wî bînin sêrî. ³ Xilazîyê ew gefa ku cihûya xwarin, ew cihûyar'a bû serk'etina ser dijminêd xwe. Ev serk'etin k'ifş kirin û nav kirin, cejina «Pûrîm», ku cihû h'eta niha jî vê cejinê dikin. Vê cejinêda cihû vê k'itêbê dixûnin û fikirêd Hamanne xirab û e'r'nafîya Esterê bîr tînin.

1

Dewlêmentîya p'adşê û neguhdarîya k'ulfeta wî

¹ R'ojêd Ah'aşwêroş p'adşada, k'îjanî ku ji Hindistanê girtî h'eta Etyûpîyayê li ser sed û bîst h'eft qeza p'adşatî dikir. ² Wê hingê, gava Ah'aşwêroş p'adşa li Sûsa qesirda li ser t'extê p'adşatîya xwe r'ûniştibû, ³ ewî sala p'adşatîya xweye sisîya, mesrefek bona h'emû wezîr-wek'îlêd xwe danî, serekeskerêd Faristanê û Medya, usa jî e'silzade û serwêrêd qezayêd bin destîya wîda t'eglifkirî bûn. ⁴ Ewî hingê gelekî dirêj, awa gotî sedh'eystê r'ojî dewlêmentîya p'adşatîya xwe û r'ûmeta mezinayîya xwe da k'ifşê. ⁵ Gava ew r'oj derbaz bûn, vê carê jî ewî gazî h'emû merivêd Sûsa qesir kir, ji mezina girtî h'eta biç'ûka, bona wan h'eft r'oja mesref h'ewşa baxçê herema p'adşêda danî. ⁶ P'er'dêd sipîye ji pembû, qedekê ji r'îsê şîrk, bi benê sorê gevez û k'itanê vegirtî hev-vakirî avîti xelaqêd zîv û stûnêd mermerva dardakirî bûn. ⁷ Ê t'ext-berp'alêd zêr' û zîv jî danîbûne h'ewşa ku bi selêd kevirîye k'esk, mermerê sipî, sedefî û mermerê r'eng-r'engîva neqîşandî bû. ⁷ Derdanêd

zêr'da û cûr'e-cûr'e derdanada tişt didane vexwarinê. Şerava p'adşê pir' bû, weke mer'danîya wî. ⁸ Her kes aza bû vexwarinêda û t'u kes h'ewcê vexwarinê nedima, çimkî p'adşê e'mirî h'emû berpîrsîyarêd mala xwe kiribû, ku ew dilê her kesî'a her'in. ⁹ Waşt'î xanimê jî bona k'ulfeta mesref mala Ah'aş-wêroş p'adşada danî.

¹⁰ R'oja h'efta, gava dilê p'adşê bi şeravê k'êfxweş bibû, gote her h'eft nemêrêd berdestîyêd xwe Mihûman, Bîzt'a, H'arbona, Bîgt'a, Avagt'a, Zêt'ar û K'ark'as, ¹¹ ku ewana Waşt'î xanimê t'acê p'adşatîyêva bînine li ber p'adşê, wekî bedewetîya wê nîşanî milleta, mîr û bega ke, çimkî ew gelekî bedew bû. ¹² Lê Waşt'î xanimê nexwest ku t'evî nemêra biçûya û e'mirê p'adşê biqedanda, p'adşa qilqilî û ji hêrsa alavê da serê wî.

¹³ Hingê p'adşê gote bîlanêd zemana* (çimkî p'adşê şêwira xwe wan h'emûya fikir, yêd ku qanûn û r'astî zanibûn, ¹⁴ usa jî h'eft mîrêd Faristan û Medîya li cem wî bûn, K'arşina, Şêt'ar, Adamat'a, T'arşîş, Meres, Marsina û Mimûk'an, evana r'ûyê p'adşê didîtin û şîretk'arêd p'adşeyê pêşin bûn): ¹⁵ «Em li gora qanûnê çi

* 1:13 Ev bîlan bi nîşanêd e'rşêd e'zmên û steyrka h'alê zemên tê derdixistin.

gerekê hindava Waştî xanimêda bikin, ku ewê e'mirê Ah'aşwêroş p'adşa ku bi nemêra li wê hatibû e'mirkirinê neqedand?»¹⁶ Hingê Mimûk'an li ber p'adşê û mîra got: «Waştî xanimê ne ku t'enê li ber p'adşê şaşîtî tê ber'da ye, lê li ber mîr-bega û t'emamîya wan miletêd qezayêd Ah'aşwêroş p'adşada.¹⁷ Çimkî kira xanimê wê li nava h'emû k'ulfetda bela be, ewê jî gur'a mêrê xwe nekin û bêjin: «Ah'aşwêroş p'adşa e'mir kir ku Waştî xanimê bînine li cem wî, lê ew ne çû». ¹⁸ Îro kirê xanimê ku bigihîje guhê k'ulfetêd Farisîya û Medyanîya, ewê jî usa caba p'adşê û mîra bidin û hingê wê gelek r'ûr'eşî û bêt'ifaqî bibe. ¹⁹ Heger ev yek li p'adşê xweş tê, bira ji wî qirarek derê, li nava qanûnêd Faris û Medyanîyada bê nivîsarê, bona ku ew neyê guhastinê, ku Waştî îdî t'u car neyê li ber Ah'aşwêroş p'adşa neskine û p'adşa xanimtîya wê bide k'ulfeteke ji wê qenctir. ²⁰ Ê gava ev e'mirê p'adşê li nava h'emû p'adşatîya wîda bê bihîstinê, ku p'ir' mezine, hingê h'emû k'ulfetê jî qedirê mêrê xwe bigirin heger ew feqîr be yan dewlemend be». ²¹ Ev gotina li p'adşê û mîra xweş hat û p'adşê li gora gotina Mimûk'an kir. ²² Ê hingê ne'me t'emamîya qezayêd p'adşê'ra hatine şandinê, li gora nivîsara her qezayê û

li gora zimanê her cime'tê, ku her kes malxê mala xwe be û bi zimanê miletê xwe xeberde*.

2

Ester dibe xanima p'adşê

¹ Pey van yekar'a, gava hêrsa Ah'aşwêroş p'adşa danî, ewî Waşt'î xanim, kirê wê û qirara xwe bîr anî. ² Xulamêd p'adşeye berdestî gotin: «Bira bona p'adşê qîzêd cahile bik'ir û berbiç'e'v bêne destxistinê. ³ P'adşa bira li nava qezayêd p'adşatiya xweda serwêra k'ifş ke, ku h'emû qîzêd cahile bik'ir û berbiç'e'v t'opî mala k'ulfetaye li Sûsa qesirda kin, bin se'vîtiya Hêgayê nemêrê p'adşê û cabdarê k'ulfet, wanr'a tiştêd bona şuştin-veşuştinê bêne dayîn. ⁴ Hingê k'îjan qîza ku p'adşa begem ke, bira ew bibe xanima p'adşê, dewsa Waşt'î xanimê». Ev gotina li p'adşê xweş hat û usa jî kir.

⁵ Li Sûsa qesirda merivekî cihû dima, navê wî Mordok'ay bû, kur'ê Yaîrê, Şîmîyê, Kîsê ji bereka Binyamînîya. ⁶ Eva ji Orşelîmê t'evî wan hêsîr hatibû anînê, k'îjan ku Nebûkedneser

* 1:22 Ha jî tê fe'mkirinê: «...Ku ev yek nava her miletîda bi zimanê wan bê e'lemkirinê».

p'adşê Babîlonê, t'evî Yexonîya p'adşê Cihûda hêsîr anîbûn. ⁷ Evî qîzapa xwe Hadasa xwey dikir, ku digotinê Ester, çimkî ne bavê wê hebû ne jî dîya wê. Ew qîzike bedew û bejin-balêda xase-xewan bû, pey mirina dê û bavê wê'r'a Mordok'ay ew çawa qîz ji xwer'a xwey dikir. ⁸ Û gava salixê qirara p'adşê hate bihîstinê û li Sûsa qesirda gelek qîz civîyane bin se'vîtîya Hêgay. Hingê Ester jî mala p'adşêda hate qebûlkirinê, bin se'vîtîya Hêgay berpîrsîyarê jina. ⁹ Hêgay qîzik begem kir û ewê li ber wî k'erem dît û ewî pê'r'a-pê'r'a her tiştêd p'ara wêye şuştin-veşuştinê xwarinêva, usa jî h'eft qîzêd carîye mala p'adşêda, k'îjan ku wê'r'a dik'etin dane wê û ew t'evî wan carîya cîguhaste mala k'ulfetaye cîyê herî qenc. ¹⁰ Esterê millet û r'ik'inyata xwe e'yan nekir, çimkî Mordok'ay t'emî dabû wê, ku e'yan neke. ¹¹ Mordok'ay her r'oj dora mala k'ulfeta diçû-dihat, wekî haş ji sih'et-qewat û h'al-h'ewalê Esterê hebe.

¹² Gava we'dê her qîzê dihat ku ew bik'eta cem Ah'aşwêroş p'adşa, gerekê ew e'detê donzdeh mehêd k'ulfet hazirbûnê'r'a derbaz bûya, şeş meha bi r'ûnê zimirê û şeş meha jî bi r'ûnê bînxweş bihata melh'emkirinê û usa jî bi dû-dermanêd mayîn, ¹³ qîzik hingê dik'ete cem p'adşê, çi ku

Ester 2

dilê wê dixwest, wêr'a dihate dayînê, bona ku t'evî xwe ji mala k'ulfet bibira mala p'adşê. ¹⁴ Êvarê ewa diçû cem p'adşê sibehê zû vediger'îya maleke k'ulfetaye mayîn, bin se'vîtiya berpîrsîyarê k'ulfeta, Şahaşigazê nemêrê p'adşê. Ewa îdî nediçû cem p'adşê, h'eta ku temê p'adşê nek'işandayê û bi navê wê gazî wê nekira. ¹⁵ Gava wextê Estera qîza Abîxayîlê apê Mordok'ay pêr'a gihîşt ku her'e cem p'adşê, ya ku Mordok'ay çawa qîz xwer'a xwey kiribû, ewa ser gotina berpîrsîyarê k'ulfeta Hêgayê nemêrê p'adşêr'a derbaz nebû, tişteki başqe nexwest. Esterê li ber wan h'emûyêd ku ew didîtin k'erem dît. ¹⁶ Ester meha deha, awa gotî meha Têbêt'ê* k'ete cem Ah'aşwêroş p'adşa, h'eftsalîya p'adşatîya wîda li mala p'adşêda hate qebûlkirinê. ¹⁷ P'adşê Ester ji h'emû k'ulfetêd xwe ze'ftir begem kir û ewê li ber wî ji h'emû qîza ze'ftir h'izkirin û k'erem dît û ewî t'acê p'adşatîyê danî serê wê, dewsa Waşt'îyê kire xanim. ¹⁸ P'adşê mesrefeke mezin bona xatirê Esterê wezîr-wek'îl û xulamêd xwer'a danî, usa jî barê ser qeza sivik kir û weke mer'danîya p'adşê xelat p'êşkêş dan.

* 2:16 R'oja îroîn ew ji nivê meha Dêktêmbêrê destpêdike h'eta nivê meha Yanvarê.

Mordok'ay sir'a serhildanê dih'ese

¹⁹ Gava cara duda qîz civandin, Mordok'ay li ber derê p'adşê r'ûniştibû*. ²⁰ Esterê hê millet û r'ik'in-yata xwe e'yan nekir bû, çawa ku Mordok'ay t'emî dabûyê. Çimkî Esterê hê usa guhdariya Mordok'ay dikir, çawa ku hêna bin se'vîtîya wîda. ²¹ Wan r'o-jada gava Mordok'ay li ber derê p'adşê r'ûdinişt, du dergehvan, Bîgt'an û T'ereş, nemêrêd p'adşê gef li p'adşê xwarin û fikirîn ku destê xwe li ser Ah'aş-wêroş p'adşa bilind kin. ²² Mordok'ay ku vê yekê h'esîya, gîhande guhê Ester xanimê, Esterê jî ev yek bi navê Mordok'ay p'adşêr'a gilî kir. ²³ Ev deng hate lênihêr'andinê r'ast derk'et û her du dergehvan jî hatine darxistinê. Û Bona vê qencîya Mordok'ay k'itêba bîranîna serhatîyada li ber p'adşê hate nivîsarê.

3

Şêwira Hamane bona qir'a cihûya

¹ Pey van yekar'a, Ah'aşwêroş p'adşa Hamanê kur'ê Hamidat'ayê Agagî mezin û bilind kir û

* ^{2:19} Derê p'adşê ew cîyê bona h'akimtîyê û cîyê şêwira cime'tê bû.

k'ursîya wî ji k'ursîyêd mîr-begêd xwe jortir kir. ² Û h'emû xulamêd p'adşêye li ber derê p'adşê, dever'ûya diçûn û li ber Haman ta dibûn, çimkî p'adşê bona wî ev e'mir dabû, lê Mordok'ay dever'ûya nedîçû û li ber wî ta nedibû. ³ Hingê xulamêd p'adşêye li ber derê p'adşê gotine Mordok'ay: «Çima tu li ser e'mirê p'adşê'a derbaz dibî?» ⁴ Wana her r'oj wî'a digotin, lê berga tiştêkî nedigirt, peyr'a ev yek gîhandine Haman, ku bizanibin k'a Mordok'ay li ser ya xwe bimîne yan na, çimkî ewî wanr'a gotibû ku ew cihû ye. ⁵ Gava Haman dît, wekî Mordok'ay dever'ûya naçe û li ber wî ta nabe, ew nava xweda gelekî qilqilî. ⁶ Lê wî'a şerm bû ku t'enê destê xwe li ser Mordok'ay bilind ke, çimkî îdî wî'a gotibûn Mordok'ay ji k'îjan miletî ye. Haman fikirî ku h'emû cihûyêd miletê Mordok'ay li t'emamîya p'adşatîya Ah'aşwêroşda qir' ke.

⁷ Û donzdehsalîya Ah'aşwêroş p'adşa, meha yekê, awa gotî meha Nîsanêda* li ber Haman bona meremê wî, bona r'oj û meh k'ifşkirinê p'ûr, awa gotî p'eşk dihate avîtinê û ew k'ete meha

* ^{3:7} R'oja îroîn ew ji nivê meha Martê destpêdikê h'eta nivê meha Aprêlê.

donzdeha, ku dibe meha Adarê*. ⁸ Hingê Haman gote Ah'aşwêroş p'adşa: «Miletek nava h'emû miletêd qezayêd p'adşatîya teda heye, nava wan miletada başqebûyî bela bûye. Qanûnêd wan ji qanûnêd h'emû mileta başqe ne. Evana qanûnêd p'adşê naqedînin û dest nade ku p'adşa van aha bihêle. ⁹ Heger ev yek li p'adşê xweş tê, bira e'mir derk'eve, ku qir'a van bê anînê. Ez xwexa jî, ezê dehe h'ezar telantê zîv** bik'işînim bidime destê qulixk'ara ku bikine xizna p'adşê». ¹⁰ Hingê p'adşê ji t'ilîya xwe, gustîla xwe derxist, da Hamanê kur'ê Hamidat'ayê Agagîyê neyarê cihûya, ku e'mirê miqabilî cihûya mor ke. ¹¹ Hingê p'adşê gote Haman: «Ez ewî zîvî jî, wî miletî jî didime te, tu çawa dixwazî usa jî bike». ¹² Sêzdehê meha yekê nivîsk'arêd p'adşê hatine gazîkirinê û wek'îlêd p'adşêr'a, h'emû welîyêd li ser qezar'a, her axayê li ser her miletîr'a, her qezayêr'a bi nivîsara wan û her miletîr'a bi zimanê wan, anegorî fermana Haman bi navê Ah'aşwêroş p'adşa hate nivîsarê û bi gustîla p'adşê hate morkirinê. ¹³ Ew nivîsar

* 3:7 R'oja îroîn ew ji nivê meha Fêvralê destpêdikê h'eta nivê meha Martê.

** 3:9 «Dehe h'ezar telantê zîv» dike weke 350 ton zîv.

bi destê qewala h'emû qezayêd p'adşêr'a hatine şandinê, ku nava r'ojekêda, meha donzdeha, awa gotî sêzdehê meha Adarê, h'emû cihûya, biç'ûk û mezin, jina û zar'a qir' kin, bikujin û k'okê lê bînin û hebûka wan t'alan kin bibin. ¹⁴ Ev qirara nivîsar li nava h'emû qezada çawa ferman hate e'lamkirinê, wekî bona wê r'ojê h'emû millet hazir sekinî bin. ¹⁵ Qewal pê qirara p'adşê zû r'êk'etin çûn û fermana nivîsar li Sûsa qesirda jî dane e'lamkirinê. P'adşa û Haman r'ûniştin vexwin, lê bajarê Sûsayê ser hevr'a derbaz dibû.

4

Mordok'ay alîk'arîyê ji Esterê dixwaze

¹ Mordok'ay gava vê yekê gişkî pê h'esîya, k'incê xwe qelaştin, k'urx li xwe kir, xwelî li ser xwe kir. Paşê çû nava bajêr bi dengê şîna giran dikire qar'în, ² gihîşte h'eta li ber dergehê p'adşê sekinî, çimkî merivê k'urxxwekirî nikaribû dergehê p'adşêr'a derbaz bûya. ³ H'emû qezada, k'îderê ku ew fermana p'adşêye nivîsar digihîstê, nava cihûyada şîneke giran bi r'ojî, girî û zare-zarê destpêdibû. Hineka jî li ser k'urx û k'uzîyê p'al didan.

⁴ Carîyêd Esterê û nemêrêd wê hatin û bona Mordok'ay wêr'a gotin, xanim gelekî t'evîhev bû û k'inc şandin, ku Mordok'ay kin û k'urx ji ser wî bêxin, lê wî qebûl nekir. ⁵ Hingê Esterê ji nemêrêd p'adşê gazî Hat'ak' kir, k'îjan ku p'adşê k'ifş kiribû ku berdestîya wê bike û şande cem Mordok'ay ku bizanibe, k'a ew çi h'ewal e û çima usa dike? ⁶ Hat'ak' çû cem Mordok'ay li meydana ber derê p'adşê. ⁷ Mordok'ay her tişt wîr'a got, çi ku li wî qewimî bû, usa jî ew gotina Haman gotê, ku ewî bona ci-hûya zîv jî soz daye bike xizna p'adşê, ku k'oka wan bînin. ⁸ Bona qir'kirina wan jî, Mordok'ay k'a-xaza Sûsayêda li ber fermana nivîsar girtî da wî, ku nîşanî Esterê ke, wêr'a jî şiroveke û bêjêda ku bik'eve cem p'adşê, lava ji wî bike û bona milletê xwe delîlekê jê bixwaze.

⁹ Hat'ak' çû gotinêd Mordok'ay Esterêr'a gotin. ¹⁰ Ester Hat'ak' li ser Mordok'ayda vege'and û gotêda ku aha bêjêyî: ¹¹ «H'emû berdestîyêd p'adşê û milletêd qezayêd p'adşê qenc zanin, ku her mêr, yan jina ku bê gazîkirin bik'eve h'ewşa p'adşêye hindur', bona wan qanûneke kuştinê heye, t'enê ewê sax bimîne, k'îjan ku p'adşa şiva xweye zêr'în berbir'î ke. Lê eva îdî sî r'ojê mine ku p'adşê gazî min nekirîye». ¹² Gotinêd

Esterê gîhandine Mordok'ay. ¹³ Mordok'ay cab li ser Esterêda şand û gotê: «Nefikire ku tu mala p'adşêda yî, ji h'emû cihûya tê t'enê xilaz bî. ¹⁴ Awa heger tu vî wextîda xwe ker' kî, wê ji cîkî din k'omek û azadî bigihîje cihûya, lê tu û mala bavê xweva hûnê unda bin, k'î zane ku tu bona r'o-ja îroyîn nebûyî xanima p'adşê». ¹⁵ Hingê Esterê cab ser Mordok'ayda şand û gotê: ¹⁶ «Her'e h'emû cihûyêd ku Sûsayêda dimînin t'op ke û bona min r'ojî bigirin, sê r'oja ne şev ne r'oj, ne bixwin ne vexwin. Ezê jî usa t'evî carîyêd xwe r'ojî bigirim û ser qanûnêr'a derbaz bim, bik'evime cem p'adşê, heger bimirim jî bira bimirim». ¹⁷ Hingê Mordok'ay çû usa kir, çawa ku Esterê wîr'a got.

5

Ester p'adşê û Haman t'eglîfî mesrefê dike

¹ R'oja sisîya Esterê k'incê xweye xanimtîyê xwe kir, h'ewşa hindur'ê heremêda, pêşberî mala p'adşê sekinî. P'adşa xana p'adşatîyêda, pêşberî derî li ser t'extê p'adşatîya xwe r'ûniştibû. ² Gava p'adşê Ester xanim dît, ku h'ewşêda sekinî ye, Est'erê li ber wî k'erem dît û p'adşê şiva destê xwedaye zêr'în dirêjî wê kir.

Est'er nêzîk çû li serê şivê k'et. ³ P'adşê gote wê: «Ester xanim, ev çi h'ewal e? Xwestina te çi ye? H'eta nîvê p'adşatîya xwe jî ezê bidime te». ⁴ Esterê got: «Heger wê li p'adşê xweş bê, bira p'adşa îro t'evî Haman bê mesrefa ku ez bona p'adşê dikim». ⁵ P'adşê got: «Zû gazî Haman kin, wekî xwestina Esterê bine sêrî». P'adşa t'evî Haman çû mesrefa Esterêye danî. ⁶ Gava şerav vedixwarin, p'adşê gote Esterê: «De bêje, xwestina te çi ye? Wê ter'a bê dayînê, çi hîvî dikî? H'eta nîvê p'adşatîya min be jî, wê bê sêrî». ⁷ Esterê lê vege'and û gotê: «Ev e xwestin û hîvîkirina min: ⁸ Heger min li ber p'adşê k'erem dîtîye û heger xwestina min jî li p'adşê xweş tê, ku hîvîkirina min bine sêrî, bira p'adşa û Haman bêne mesrefa ku ezê bona wan daynim û sibê ezê bi gotina p'adşê bikim».

Haman dike ku Mordok'ay bide kuştinê

⁹ Wê r'ojê Haman bi dilê eşq û şa derk'et çû, lê gava Haman Mordok'ay li ber derê p'adşê r'ûniştî dît, ku li ber wî r'anabe û ji cîyê xwe jî nah'eje, alavê da qafê Haman. ¹⁰ Lê Haman wê demê xwe zeft kir û gava vege'îya mal, şand gazî jina xwe Zereşê û pismamêd xwe kirin. ¹¹ Haman wan'r'a got bona hebûka xweye p'ir', bona

xweyê gelek kur'a, bona wan tišta, bi k'îjana p'adşê ew mezin kirîye û çawa ew ji mîr-bega û ji xulamêd p'adşê bilindtir kirîye. ¹² Lê belê Haman got: «H'eta Ester xanimê jî pêştirî min kesek t'evî p'adşê t'eglîfî mesrefa xweye danî nekir, bona sibê jî ez t'evî p'adşê t'eglîfîkirîyê cem wê me. ¹³ Lê r'ast ev h'emû jî bona min ne t'u tişt in, h'eta ku ez Mordok'ayê cihû li ber derê p'adşê r'ûniştî bibînim». ¹⁴ Hingê Zereşa jina wî û h'emû pismamêd wî lê vege'andin û gotine wî: «Bira bilindayîya pêncî zendî darek bê hazirkirinê û serê sibê bêje p'adşê, bira Mordok'ay li ser bê lêxistinê û paşê tu t'evî p'adşê bi dilê r'ih'et her'e mesrefê». Ev gotina li Haman xweş hat û ew dar da hazirkirinê.

6

P'adşa qencîya Mordok'ay dişêkirîne

¹ Wê şevê xewa p'adşê t'eqisî, ewî e'mir kir, ku k'itêba bîranîna serhatîya bînin li ber p'adşê bixûnin. ² Wêda nivîsar hate dîtinê, ku Mordok'ay e'lametî dabû, ku çawa du nemêrêd p'adşêye dergehvan, Bîgt'an û T'ereş şêwira xwe kiribûn ku destê xwe li ser Ah'aşwêroş p'adşa bilind kin. ³ Hingê p'adşê got: «Lê ji ber wê

qencîyêva çi qedir yan hurmet Mordok'ayr'a hatîye kirinê?» Berdestîyêd p'adşê gotinê: «T'u tişt bona wî nehatîye kirinê». ⁴ P'adşê got: «H'ewşêda k'î heye?» Wê demê jî Haman hatibû h'ewşa mala p'adşêye derva ku t'evî p'adşê xeber de, wekî Mordok'ay li wî darî xin, k'îjan ku bona wî hatibû hazirkirinê. ⁵ Berdestîyêd p'adşê gotine wî: «Va ye Haman h'ewşêda ye». P'adşê got: «Bira bê hindur'». ⁶ Gava Haman hate hindur', p'adşê wîr'a got: «Haman, bona wî merivê ku p'adşa bixwaze qedirekî wîr'a bike, bi t'exmîna te çi bê kirinê?» Haman dilê xweda fikirî xwexa xwer'a got: «Pêştirî min îdî p'adşayê k'êr'a bixwaze qedir bike?» ⁷ Hingê Haman li p'adşê vege'and û gotê: «Bona wî merivê ku p'adşa dixwaze jêr'a qedir bike, ⁸ bira wîr'a k'inca p'adşatîyêye ku p'adşa li xwe werdigire bînin, wî hespê k'ofîya p'adşatîyê sêrî bînin k'îjan ku p'adşa lê sîyar dibe ⁹ û k'inc û hespê bidine destê gire-girê mîrêd p'adşê yekî û k'inca li wî merivî kin, yê ku p'adşa dixwaze wîr'a qedir bike, ewî li hespê sîyar kin, bibine meydana bajêr û pêşîya wî bikine gazî: «Bona wî merivî wê aha bê kirinê, k'îjanîr'a ku p'adşa bixwaze qedir bike!» ¹⁰ Hingê p'adşê gote Haman: «De niha li gora wê gotina xwe zû r'abe,

k'inc û hespê hilde, bona Mordok'ayê cihû ku li ber derê p'adşê r'ûdinê usa bike, ji wê gotina te, bira t'u tişt jê kê m nebe». ¹¹ Haman k'inc û hesp hildan, k'inc li Mordok'ay kir, ew li hespê sîyar kir, bire meydana bajêr, pêşîya wî dikire gazî: «Bona wî merivî wê aha bê kirinê, k'îjanîr'a ku p'adşa bixwaze qedir bike!» ¹² Mordok'ay vege'îya li ber derê p'adşê, lê Haman me'dekirî ji şerma sergirêdayî lezand çû mala xwe. ¹³ Haman ev her tiştê ku hate serê wî, jina xwe Zereşê û h'emû pismamêd xwer'a gilî kir. Hingê bîlanêd wî û jina wî Zereşê wîr'a gotin: «Heger Mordok'ay ji miletê cihû ye, r'ûyê k'îjanîda te destpêkir bik'evî tê zora wî nebî, li ber wî tê e'se dever'ûya her'î». ¹⁴ Vana hê t'evî wî xeber didan, nemêrêd p'adşê hatin, Haman lezxistin, ku her'e wê mesrefa ku Esterê hazir kirîye.

7

Haman tê darxistinê

¹ P'adşa t'evî Haman çû mesrefê cem Esterê.
² R'oja duda jî ku dixwarin û şerav vedixwarin p'adşê gote Esterê: «Ester xanim, de bêje xwestina te çi ye? Wê ter'a bê dayînê. Çi hîvî dikî? H'eta nîvê p'adşatîya min be jî, wê bê sêrî».

³ Ester xanimê lê veger'and: «Heger min li ber ç'e'vê te k'erem dîtîye, p'adşayî xweş be û heger xwestina min li p'adşê xweş tê, bira e'mirê min li min bê p'êşk'êşkirinê û ji ber hîvîkirina minva jî, miletê min! ⁴Çimkî ez miletê xweva qir'kirin, kuştin û undakirinêr'a hatine firotanê. Heger em çawa xulam û xulamok hatibûna firotanê, minê qet deng nekira, lê belê neyar nikare zîyana p'adşê lê veger'îne*». ⁵Hingê Ah'aşwêroş p'adşa li Ester xanimê veger'and û gotê: «Ew k'î ye, yan k'a ew k'u ye, yê ku ji serê xwe derbaz bûye van yeka dike?» ⁶Esterê got: «Ewî mixenet û neyar, ew Hamanê hanî xirab e». Haman li ber p'adşê û Esterê qurifî hev. ⁷P'adşa bi hêrs k'asa xwe danî, r'abû çû baxçê k'oç'ikserê. Lê Haman li wir ma, wekî bona e'mirê xwe lava ji Ester xanimê bike, çimkî ewî tê derxist ku p'adşê tişteki xirab bona wî qirar kirîye. ⁸Gava p'adşa ji baxçê k'oç'ikserê veger'îya oda mesrefê, dîna xwe dayê va Haman li ser t'ext-p'ala Esterê k'etî ye. Hingê p'adşê got: «Evê mala mînda dest bavêje xanima p'adşê jî!» Gava ev yek ji devê p'adşê derk'et, r'ûyê Haman

* ^{7:4} Bi îbranî ha jî tê fe'mkirinê: «Lê belê te'lî-tengîya miletê min nikarin himberî zîyana p'adşê bikin».

k'efen kirin nixamtin. ⁹ Hingê H'arbonayê, yek ji nemêrê berdestîyê p'adşê got: «Lê ne t'enê ev, va ye darekî bilindayîya pêncî zendî jî Haman bona Mordok'ay, yê ku p'adşa xilaz kir, hazir kirîye, wê li ber derê Haman e». P'adşê got: «De ewî he- ma li wî darî xin». ¹⁰ Haman li wî darî xistin ku ewî bona Mordok'ay hazir kiribû. Û paşê hêrsa p'adşê danî.

8

Ester digihîje meremê xwe

¹ Wê r'ojê Ah'aşwêroş p'adş mala Hamanê ne- yarê cihûya p'êşk'êşî Ester xanimê kir, Mordo- k'ay jî hat r'ûyê p'adşê k'et, çimkî Esterê gotibû ku ew çî wê ye. ² Hingê p'adşê gustîla destê xwe derxist, k'îjan ku ji Haman standibû û ew da Mordok'ay, Esterê jî Mordok'ay li ser mala Ha- manr'a k'ifş kir.

³ Esterê xeberdana xwe dîsa li ber p'adşê di- rêj kir, xwe avîte nigêd wî û bi girî lava ji wî kir, wekî wê xirabî û şêwira Hamanê Agagî bo- na qir'a cihûya hazirkirî bide betalkirinê. ⁴ P'adşê şiva zêr'în dirêjî Esterê kir, Ester r'abû ser xwe li ber p'adşê sekinî ⁵ û got: «Heger li p'adşê xweş tê û min li ber wî k'erem dîtîye

û heger ev yek li ber ç'e'vê p'adşê r'ast e û ew min begem dike, bira bê nivîsarê ku ew şêwira Hamanê kur'ê Hamidat'ayê Agagî bê betalkirinê, k'îjan ku ewî ne'me nivîsîn ku h'emû qezayêd p'adşêda qir'a cihûya bînin. ⁶Niha ezê çawa bikaribim bibînim xezeba ku wê bê serê milletê min, yan çawa bikaribim bibînim mirina pisma-mêd xwe?»

⁷Ah'aşwêroş p'adşa gote Ester xanimê û Mordok'ayê cihû: «Haman ku destê xwe hildabû li ser cihûya, min mala wî p'êşkêşî Esterê kirîye û ew jî daye darxistinê. ⁸Niha hûn bi navê p'adşê bona cihûya çawa dilê we dixwaze binivîsin û bi gustîlka p'adşê mor kin, çimkî nivîsara bi navê p'adşê û bi gustîla p'adşê morkirî nayê betalkirinê».

⁹Û hingê bîst sisêyê meha Sîwanê*, awa gotî meha sisîya nivîsk'arêd p'adşê hatine gazîkirinê, her tişt li gora gotina Mordok'ay, cihûya, wek'îla, welîya û serwêrêd qezar'a, her sed bîst h'eft qezar'a hate nivîsarê, ji Hindistanê girtî h'eta Etyûpîyayê, her qezayêr'a bi nivîsara wan, her milletîr'a bi zimanê wan, usa jî cihûyar'a bi nivîsara wan û bi zimanê wan. ¹⁰Bi navê

* 8:9 R'oja îroîn ew ji nivê meha Mayê destpêdikê h'eta nivê meha Îyûnê.

Ah'aşwêroş p'adşa nivîsî û bi gustîla p'adşê mor kir, da destê qewala û ew li meh'înêd tewla p'adşê sîyar kirin û şandin, ¹¹ bi vê yekê da k'ifşê ku p'adşê serbestî daye cihûyêd h'emû bajarada, ku pişt bidine piştta hev, e'mirê xwe xwey kin û h'emû ç'ekdarêd neyarêd xweye nava mileta û qezada, qir' kin, bikujin, jin û zar'ava k'okê lê bînin û hebûka wan t'alan bibin, ¹² bona wê yekê h'emû qezayêd Ah'aşwêroş p'adşada, sêzdehê meha donzdeha, awa gotî sêzdehê meha Adarê hate k'ifşkirinê. ¹³ Ew fermana nivîsar her qezayêda bona h'emû mileta çawa qanûn hate e'lamkirinê, wekî cihû bona wê r'oje hazir bin, ku h'eyfa xwe ji neyarêd xwe hildin. ¹⁴ Qewal li meh'înêd p'adşê sîyar bûn, bi fermana p'adşê zû r'ê k'etin çûn. Ev yek li Sûsa qesirda jî hate e'lamkirinê.

¹⁵ Mordok'ay bi k'incê p'adşatîyêye r'engê şîrk û sipî, t'acê zêr'înî mezinva, sermilkê k'itanîyî sipî û sorê gevez wergirtî derk'ete li ber p'adşê. Bajarê Sûsayê ji eşqa h'ejîya û şa bû. ¹⁶ Hingê cihûya r'onayî, eşq, şabûn û qedir dîtin. ¹⁷ Her qeza û her bajarê dera ku ferman û gotina p'adşê digihîştê, eşq û şabûn dik'ete nava cihûya, r'oja k'êfê û cejinê bû. Gelek ji miletêd welata dibûne cihû, çimkî sawa cihûya k'etibû li ser wan.

9

Cihû h'eyfa xwe hildidin

¹ Sêzdehê meha donzdeha, awa gotî meha Adarê, gava we'dê ferman û gotina p'adşê pêr'a gihîşt, h'eta wê r'ojê dijminêd cihûya li ser wê fikirê bûn, ku wê va h'ukumî li ser wan bikin, lê bona wan ew dewr welger'îya, çimkî cihûya h'ukumî li ser wan neyarêd xwe kirin. ² Wê hingê cihûyêd bajarêd h'emû qezayêd Ah'aşwêroş p'adşada pişt dane pišta hev, ku destêd xwe hildine li ser wan kesêd ku xwastine xirabîyê li wan bikin û kesek nikaribû li ber wan r'abûya, çimkî sawa wan k'etibû li ser h'emû mileta. ³ Ê h'emû mîrêd qeza, wek'îl, welî û wezîrêd p'adşê pišta cihûya digirtin, çimkî sawa Mordok'ay k'etibû li ser wan. ⁴ R'astî jî Mordok'ay mala p'adşêda yekî mezin bû, nav û dengê wî li h'emû qeza bela bibû, usa ku ew meriv, awa gotî Mordok'ay r'oj bi r'oj bilind dibû. ⁵ Cihûya bi şûr h'emû neyarêd xwe xistin, kuştin qir'kirin û çawa xwestin usa serê peyk'etîyêd xwe kirin. ⁶ Cihûya li Sûsa qesirda pênsid merî kuştin k'ok lê anîn. ⁷ Usa jî Parşandat'a, Dalpon, Aspat'a, ⁸ Porat'a, Adalya, Arîdat'a, ⁹ Parmaşt'a,

Arîsay, Arîday û Wayzat'a, ¹⁰ ev her dehe kur'êd Hamanê kur'ê Hamidat'a, neyarê cihûya jî kuştin, lê dest nedane hebûka wan.

¹¹ Hema wê r'ojê h'esabê kuştîyêd Sûsa qesirda gihîşte p'adşê. ¹² P'adşê gote Ester xanimê: «Cihûya li Sûsa qesirda pênsid merî û her dehe kur'êd Haman jî kuştine, qir' kirine, gelo qezayêd p'adşêye mayînda niha çi kirine? De bêje, îdî çi dixwazî? Ewê bê dayînê. Niha hîvîkirina te çi ye? Wê bê sêrî». ¹³ Esterê lê veqer'and û gotê: «Heger bi dilê p'adşê be, bira sibê jî cihûyêd Sûsayêr'a mecal bê dayînê, ku li gora vê qirara îro bikin û cinyazê her dehe kur'êd Haman bêne darxistinê». ¹⁴ P'adşê e'mir kir, ku usa bibe. Sûsayêda ferman hate e'lamkirinê, cinyazê her dehe kur'êd Haman hatine darxistinê. ¹⁵ Cihûyêd Sûsayêda çardehê meha Adarê jî civîyan û Sûsayêda sêsid merî kuştin, lê dest nedane hebûka wan.

¹⁶ Cihûyêd mayîye qezayêd p'adşêda jî civîyan, pişt dane pišta hev, ku xwe xwey kin û ji dijmina r'ih'et bûn, ji neyarêd xwe h'eftê pênc h'ezar merî kuştin, lê dest nedane hebûka wan. ¹⁷ Ev yeka sêzdehê meha Adarê qewimî û çardehê wê mehê cihûyêd qezada r'ih'et bûn û ew kirine r'oja eşqê û şabûnê.

¹⁸ Lê cihûyêd Sûsayêda sêzdeh û çardehê mehê civîyan ya xwe kirin û panzdehê mehê r'ih'et bûn û ew kirine r'oja eşqê û şabûnê. ¹⁹ Lê belê cihûyêd gundî, ku der û bestêd vekirîda diman, ewana çardehê meha Adarê cejinê dikin, çawa r'ojeke eşqê û şabûnê û p'êşkêşa hevr'a dişînin.

²⁰ Mordok'ay bona bîranînê ev yek nivîsî û ne'me şandine h'emû cihûyar'a, k'îjan ku li qezayêd Ah'aşwêroş p'adşada dûr û nêzîk diman, ²¹ ku ewana her sal nava xweda çardeh û panzdehê meha Adarê k'ifş kin. ²² Çimkî van r'oja cihû ji neyarêd xwe r'ih'et bûn û meha k'edera wan bû şabûn û şîna wan jî bû r'oja cejinê, ku van r'oja bikine r'ojêd eşq û şabûnê, p'êşkêşa bidine hev û k'esîbar'a xêra bikin. ²³ Cihûya ev yek qebûl kir, ku îdî k'arê xwe kiribûn bikirana, çî ku Mordok'ay wan-r'a nivîsî. ²⁴ Çawa neyarê h'emû cihûya, Hamanê Hamidat'ayê Agagî şêwirî bû, ku qir'a cihûya bîne û p'ûr avîtibû, awa gotî p'êşk, ku wan qir' ke û k'oka wan bîne. ²⁵ Lê gava Ester çû cem p'adşê, p'adşê bi ne'ma e'mir kir, ku ew şêwira Hamane xirab, ya ku ewî bona cihûya hazir kiribû bê serê wî û wî kur'ava jî dara xin. ²⁶ Lema jî van r'ojar'a gotin Pûrîm, anegorî fe'mîna xebera pûr. Bona

wan h'emû gotinêd vê ne'mê û usa jî bona wê yekê çî ku dîtin û çî ku hate serê wan. ²⁷ Cihûya qırar kir û ev yeka kirine borcê stûyê xwe û r'ik'inyata xwe û usa jî ewêd ku gihîştibûne wan, wekî her sal bê têber'dan van her du r'oja anegorî nivîsar û wextê wan k'ifş kin. ²⁸ Ev r'oj gerekê qur'ne-qur'ne bi cejinê nava her qebîlê, her qezayê û her bajarîda bêne bîranînê. Ev r'ojêd Pûrîmê gerekê nava cihûyada neyêne hildanê û bîranîna wan ji nava zar'êd wan dernek'eve.

²⁹ Ester xanima qîza Abîxayîl û Mordok'ayê cihû h'eta qewata wanda çû, wana ne'ma duda bona e'seyîkirina Pûrîmê nivîsîn. ³⁰ Ê bi gotinêd e'dilayîyê û r'astîyê ne'me h'emû cihûyar'a hatine şandinê, yêd ku sed bîst h'eft qezayêd Ah'aşwêroş p'adşada diman, ³¹ wekî van r'ojêd Pûrîmê we'dada k'ifş kin, çawa ku Mordok'ayê cihû û Ester xanimê t'emî da wan. Wan jî ev yek kirine borcê stûyê xwe û zar'êd xwe, çawa r'ojî bona oxirmêd wane girane hewar-gazîyê û şînê. ³² Ê bi vî awayî fermana Esterê t'emîya bona Pûrîmê e'seyî kir û ew k'itêbêda hate nivîsarê.

10

Mordok'ay cîyê Haman digire

¹ Paşê Ah'aşwêroş p'adşa kire ser welêt ku xerc biddin, h'eta ewêd ku giravêd be'rada dimînin jî. ² Bona qewat û zorayîya h'emû kirêd Ah'aşwêroş p'adşa û mezinayîya Mordok'ay, ku çawa p'adşê ew bilind kir û ev h'emû bi hûr-gilî li k'itêba bîranîna serhatîyadaye p'adşê Medya û Faristanêda nivîsar e. ³ Belê Mordok'ayê cihû pey Ah'aşwêroş p'adşar'a yê duda bû û nava cihûyada jî mezin bû, h'izkirîyêd gelek biratîya xwe bû, xêrxwazê milletê xwe bû û t'ema-mîya cime'ta xwer'a bona e'dilayîyê xeber dida.



K'itêba Ûnis

Pêşgotin

Ev k'itêb bona merivekî gilî dike, yê ku xwest ji t'emîya Xudane wîr'a dayî bir'eve. Serhatîya vê k'itêbê qur'na 8-da berî bûyîna Îsa qewimîye. Xwedê t'emî li Ûnis kir wekî xebera wî binalîyêd Nînewayêr'a dannasîn ke, Nînewayê p'ayt'extê împêratorîya Aşûrîyaye pozbilind bû. Lê Ûnis nexwest ku her'e, wekî binalîyêd Nînewaye dijminêd Îsraêl, ji gunêd xwe vege'rin û r'e'ma Xudan nestînin. Bi vî awayî Ûnis ji Xwedê r'evî û xwest ku ji Nînewayê dûr k'eve. Pey çend qewimandinar'a Ûnis gur'a Xwedê kir, lê hêrs k'et gava Xwedê binalîyêd Nînewayê hate r'e'mê. Bona vê kira xweye ner'ast Xwedê

Ûnis 1

Ûnis hilat. ² Vê serhatîyêda çend sûretêd Xwedêye sereke têne nîşankirinê. Ûnis ew sûretê miletê cihûya ye, ku difikirin wekî miletêd başqe nehêjayî xilazkirina Xwedê ne. Lê Xwedê t'enê cihûya h'iz nake, ew usa jî r'e'mê li wan miletêd mayîn dike, k'îjan ku wî qebûl dikin. Heger miletek hilatina Xwedê dibihê û ji kirêd xweye xirab vediger'e, hingê Xwedê hêrsa xwe li wî r'anake. Xwedê h'ukumî ser mirin û jîyîna e'firînêd xwe dike, lema heger ew bixwaze bibaxşîne yekî, merivekî din îzina wî t'une li ser vê yekê hêrsa xwe r'ake. ³ Peymana Nûda Îsa jî bona serhatîya Ûnis dibêje, ku bona mirin û qîyametîya xwe e'yan ke. Usa jî Îsa guhdarvanêd xwer'a bona vege'andina binalî-yêd Nînewayê dibêje (Metta 12:38-41; Marqos 8:11-12; Lûqa 11:29-32).

1

Ûnis gur'a Xudan nake

¹ Xebera Xudan Ûnisê kur'ê Amîttayr'a hat û got: ² «R'abe her'e bajarê Nînewaya mezin danna-sîn ke û wê cime'tê hilê, çimkî neheqîyêd wan gihîştine li ber p'er'ê e'zmên». ³ Lê Ûnis r'abû ku ji ber ç'e'vê Xudan bir'eve T'arşîşê. Ew ber'jêrî

Ûnis 1

Yafayê bû, gemîk dît ku diçû T'arşîşê, ewî heqê r'îya xwe dayê, k'ete gemîyê ku t'evî wan her'e T'arşîşê, wekî ji destê Xudan bir'eve.

⁴Lê Xudan bakî qayîm li be'rê r'akir û be'rêda fir-toneke mezin r'abû, ew bû ku gemî hûrdexweşî bûya. ⁵Hingê gemîvan tirsîyan û her merivekî hewara xwe xwedêyê xwe anî û ew derdanêd ku gemîyêda hebûn avîtine be'rê, wekî barê gemîyê sivik kin. Lê Ûnis çûbû k'etibû lap binê gemîyê, p'aldabû û k'etibû xewa k'ûr.

⁶Serwêrê gemîyê hate cem Ûnis û gotê: «Ev çi xewt'êşe k'etîye ç'e'vê te? Hela r'abe gazî xwedê xwe ke! Belkî xwedê te me bîr bîne û em unda nebin». ⁷Hingê gotine hev: «Werin em p'eşk bavêjin k'a eva qezîya r'ûyê ji me k'îjanîda hatîye li serê me» û p'eşk avîtin, p'eşk p'ara Ûnis k'et. ⁸Hingê gotine Ûnis: «De niha mer'a bêje, r'ûyê k'êda eva qezîya hatîye li serê me? Tu xweyê çi şixulî yî? Tu ji k'u tê yî? Ji k'îjan welatî yî û ji çi milletî yî?» ⁹Lê ewî li wan vege'and û got: «Ez Îbranî me. Ji Xudan Xwedêyê e'zmên, e'firandarê be'r û bejê xof dikim». ¹⁰Hingê xof k'ete li ser wan û gotine wî: «Te çima ev yek kirîye?» Çimkî ew merivana pê h'esîyabûn ku eva ji destê Xudan dir'eve, pêşda ewî wanar'a gilî kiribû. ¹¹Paşê gotinê: «Niha em te çawa bikin,

Ûnis 1, 2

wekî be'r li me veger'e biseqir'e?» Çimkî çiqas diçû pêlêd be'rê hê r'adibûn. ¹²Hingê Ûnis gote wan: «Min hildin bavêjine be'rê û be'rê li we veger'e biseqir'e, çimkî ez zanim ku r'ûyê minda eva yeka hatîye li serê we».

¹³Wan meriva hê bêr dik'işandin, dikirin ku xwe li bejê bigirin, lê ji qewata wan der bû, çimkî pêlêd be'rê çiqas diçû hê li wan r'adibûn. ¹⁴Hingê wana hewara xwe Xudan anî û gotin: «Ya Xudan, em r'eca ji te dikin, ne be ku li r'ûyê vî merivîda em unda bin û xûna vî li cîyê heqî-neheq li ser meda neyne, çimkî te Xudan, weke qirara xwe kir». ¹⁵Û Ûnis hildan avîtine be'rê û be'r ji wê t'evr'abûna xwe seqir'î. ¹⁶Ew merivana ji Xudan gelekî tirsîyan, qurban Xwedêr'a dan û ad-qirar kirin.

2

Dua Ûnis

¹Hingê Xudan e'mirî li ser h'ûtekî kir ku Ûnis daqurtîne û Ûnis sê r'oj û sê şeva zikê h'ûtta ma. ²Pey vê yekêr'a Ûnis zikê h'ûtta gazî Xudan Xwedê xwe kir. ³Û got:

«Min tengasîya xweda gazî Xudan kir
û wî caba min da,

Ûnis 2

- ji zîkê dîyarê mirîyada hewar kir
û te dengê min bihîst.
- ⁴ Te ez avîtime nav dilê k'ûrayîya be'rê
û h'ejêd ava ez nixamtîm,
h'emû avêd te pêlêd wanva li ser minr'a çûn.
- ⁵ Hingê min got: «Ez ji ber ç'e'vêd te hatime
avîtinê,
lê belê ezê dîsa bibînim p'aristgeha
teye pîroz».
- ⁶ Ava ez mina kirim û bîn li min diç'îkîya,
k'ûrayîya be'rê ez nixamtîm
û gîhayê be'rê li serê min p'êç'îya.
- ⁷ H'eta r'îk'inê ç'îya ez çûme xarê,
e'rdê çawa axilê h'eta-h'etayê dora min
girtibû.
Lê tê e'mirê min ji gor'istên derxî,
Xudan Xwedêyê min.
- ⁸ Gava ez k'etime li ber r'uh',
Xudan min tu bîr anî
û duayê min gihîşte p'aristgeha teye
pîroz.
- ⁹ Ewêd ku pey tiştêd p'ûç'e derew dik'evin,
ew dest ji yê xweyî r'e'm û k'erem
dik'îşîn.
- ¹⁰ Lê ezê bi dengê şikirdarîyê qurbanê
ter'a bidim

Ûnis 2, 3

û çî min soz daye jî ezê bînime sêrî.

Xilazbûn t'enê ji destê Xudan e».

¹¹ Û hingê Xudan e'mir li h'ût kir, h'ût kire hoqîn
Ûnis avîte bejê.

3

Ûnis gur'a Xudan dike

¹ Xebera Xudan cara duda Ûnisr'a hat û got:
² «R'abe her'e bajarê Nînewaya mezin wê yekê na-
va wêda dannasîn ke, çî ku ez ter'a dibêjim». ³ Hin-
gê Ûnis li gora gotina Xudan r'abû çû Nînewayê.
Nînewa jî bajarekî bêh'esab mezin bû, misk'enê
wê weke r'îya sê r'oja bû. ⁴ Ûnis r'abû k'ete bajêr,
r'îya r'ojekê qedand, dannasîn fikir û digot: «Hela
hê çil r'oj heye, ku Nînewa wêran be».

⁵ Binalîyêd Nînewayê bawerîya xwe Xwedê anîn,
qirar kirin ku r'ojî bigirin û ji ç'ûka h'eta mezina
k'urx li xwe kirin.

⁶ Gava ev deng k'ete guhê p'adşê Nînewayê,
ew ji ser t'extê xwe r'abû û çuxê li ser xwe êxist,
k'urx li xwe kir û li nava k'ozîyêda r'ûnişt. ⁷ Nav
Nînewayêda deng da belakirinê û got: «Anegorî
gotina p'adşê û giregira, bira meriv û h'eywan,
pez û dewar t'u tiştî te'm nekin, neç'êrin ne jî
vexwin. ⁸ Bira meriv û h'eywan k'urx li

xwekin û bikin zarîn gazî Xudan kin. Bira her meriv ji r'îya xweye xirab veqer'e û destê xwe ji h'eramîyê bik'işîne. ⁹ K'î zane? Belkî Xudan gotina xwe biguhêze û li me veqer'e, wekî hêrsa wî li me dayne, ku em unda nebin».

¹⁰ Gava Xwedê ev kirina wan dît, ku ew ji r'îya xweye xirab veqer'îyan, Xwedê bona wê xezeba ku gotibû wê banîya li serê wan, gotina xwe gûhast û ew yek ne anî li serê wan.

4


Berxwek'etina Ûnis û r'e'ma Xudan

¹ Ûnis gelekî li ber xwe k'et û hêrs k'et. ² Ber bi Xudan dua kir û got: «Ya Xudan, gava ezî hê welatê xweda bûm, bona vê yekê min ne digot ku tu yekî aha yî? Lema min fikir ku ez bir'evîyama T'arşîşê. Çimkî min zanibû ku tu Xwedêkî r'e'm î û dilşewat î, sebir-sik'an î, r'e'm-k'erem î û ji hêrsk'etinê jî zû vediger'î. ³ Lê niha ya Xudan, r'eca dikim r'uh'ê min ji min bistîne, çimkî mirina min ji jîyîna min çêtir e». ⁴ Xudan gotê: «Gelo heq e, ku tu bona vê yekê bîna xwe haqasî teng dikî?»

⁵ Ûnis ji bajêr derk'et, alîyê r'ohilata bajêr r'ûnişt û li wir xwer'a h'olikek çêkir û bin sîya

Ûnis 4

wêda r'ûnişt, ku dîna xwe bide bajêr k'a wê çî bi-qewime. ⁶ Hingê Xudan Xwedê e'mirî li k'olekê kir, ew k'ol mîna darê şîn bû û li ser Ûnis kire sî, ku wî ji wê bîntengîyê xilaz ke. Ûnis bona wê k'olê gelekî şa bû. ⁷ R'oja din sibehê zû, Xudan e'mirî li kurmekî kir ew k'ola kot û ew h'işk bû. ⁸ Gava te'v derk'et, bi e'mirê Xwedê, alîyê r'ohilatê bakî k'ew û germ r'abû, te'vê li serê Ûnis xist, ew sist bû, mirina xwe xwest û got: «Mirina min ji jîyîna min çêtir e». ⁹ Hingê Xudan gote Ûnis: «Gelo heq e, ku tu bona vê k'olê bîna xwe haqasî teng dikî?» Ûnis got: «Belê, heq e ku ez bîna xwe teng dikim, h'eta mirina xwe jî ez r'azî me». ¹⁰ Lê Xudan gotê: «H'eyfa te wê k'olê tê, ya ku te xûdan li ser ner'êt û mezin nekir, k'îjan ku nav şevêkêda şîn bû û şevêkêda jî h'işk bû. ¹¹ Lê h'eyfa min çawa ji wî bajarê Nînewaya mezin neyê, ku nav wêda sed bîst h'ezar merivî zêdetir hene, ku destê ç'ep û r'astê ji hev dernaxin, usa jî gelek h'eywan?»



Horace Knowles © The British & Foreign Bible Society 1954, 1967, 1972

Serecem

Sernivîsar.....	9
K'itêba R'ût'	13
K'itêba Ester.....	39
K'itêba Ûnis	93